Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1317 | 19-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Jin di komînan de xwe û civaka xwe rêxistin dike’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Leyla Gulo da zanîn ku ew her dem dixwazin jin di nav guhertin û veguhertinê de be û got: “Jin di komînan de xwe û civaka xwe rêxistin dike.”**

komîn di wateyê de pênaseya civakîbûnê ye. Civakbûn jî yekser bi jinan ve girêdayî ye, li ser vê bingehê jî jinan li seranserî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komînên li ser bingeha azadiya jinan ku xwe dispêre komûnalîzma jinan, birêxistin kirine. Jin bi vî awayî li dijî pergalên netew-dewletê yên ku rêxistinkirina desthilatdariyê, endezyariya ku civakeke yek reng armanc digre, nasnameyan tîne hemberî hev û wekî amûr bi kar tîne têdikoşin û li şûna wê bi pergala komînan a ku rêveberiya civakî bi rêxistin dike, xwe dispêre xwezaya civakî ya pir nasnameyî û çandî, hevgirtin û têkiliyên demokratîk bi pêş dixe, ava kirin.

Di derbarê rola jin di Komînan de Rêveberiya Meclisa Taxa Hilêliyê Leyla Gilo ji Rojnameya me re axivî.

Leyla Gilo di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: “Komîn ji gelek komîteyan tên avakirin û her komîteyek bi karê xwe radibe. Di hundirê komînê de mêr û jin bi rengekî hevbeş kar û xebatê didin meşandin. Jin di nava komînê de cihê xwe di gelek komîteyan de digre û dide meşandin wek; Komîteya Lihevanînê, Komîteya Parastinê, Komîteya Tenduristiyê, Komîteya Xizmetguzariyê û Komîteya



Jin. Komîn li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tevî gund û kampên penaberan, bi tevlîbûna hemû pêkhateya hatine avakirin. Komîn bingeha avabûna civakê ye. Bi saya şoreşa Rojava jin di hemû qadan de cihê xwe girt û bû sitûna bingehîn a civakê. Her wiha Rêber Apo jî gelek balê dikşîne ser girîngiya komînan. Daxwaza me perwerdeya ji bo gel re di komînan de bên domandin. Di heman demê de roja şemiyê endam û mamosteyên Rêveberiya Xweser tên komînan ziyaret dikin. Jina kurd bi avakirina komînê re cihekî girîng di nava xebatên komînan de girt. Jin her tim hewl dide ku tevahî pirsgirêkên di nava kesan, tax û civakê de bi rengekî komînal û civakî çareser bike.

Komîn derfetê dide civakê ku xwe bi xwe bi rê ve bibe ji xizmetguzariyan sûdê bigre heta mijarên civakî û perwerdeyê. Komîn bingeha Rêveberiya Xweseriya Demokratîk e û hêza wê ya navendî ye. Bê komînan mecils ava nabin, lewre komîn biçûktirîn hêza rêxistina gel in. Komîn nûnertiya civakê di meclisê de dikin û meclis nûnertiya hemû komînan di rêveberiya sivîl a demokratîk de dikin.”

**‘Rêxistinkirina jinê, rêxistinkirina civakê ye’**

Leyla di berdewamiya axaftina xwe de behsa rewşa jin bi avabûna komînan kir û got: “Wek ku tê zanîn berî avakirina komînan jin cihê wê tenê di malê û li ber zarokan bû. Jin ji hemû xeyal û armancên xwe hatibû mehrûm kirin. Lê bi avabûna komînan jin xwe nas kir û roj bi roj tevlî perwerdeyan bû, her wiha berpisyariya civakê jî da ser milê xwe. Êdî jin bi xwe hesiya ku cihê wê ne tenê di malê de ye lê belê cihê jin di her aliyê civakê de ye. di heman demê de ji bo destxistina mafê jinan bibe pêşenga civakê, lewma jin ev gav ji komînan da destpêkirin. Niha jin cihê xwe di gelek qadan de rêveberiya civakê dike. Bi avabûna komînan jin gelek pêşketin di kesayeta xwe û civakê de da avakirin. Di dîroka jin de pir zor û zordarî heye bi taybet ji aliyê islamê ve mafê jin hatibû xwarin. Di riya islamê de jin hat girêdan, lê belê bi derketina fikir û felsefeya Rêber Apo rêya jin hat ronî kirin ku êdî karîbû ew ew sûc û kiriyarên li hemberî wê tê kirin, bibîne û şser bike. bêguman ew qalibê bindestiyê hat şikandin. Di roja me ya îro de pirojeyên ku Rêber Apo pêşkêş kiriya, jin rolekî serke tê de dilîze. jin komîn bi rêve dibe, ew sîstema hevserokatiyê di her qadekî de daye avakirin. Her wiha niha her jinek bi rêya komînan kesayeta xwe û civakê dide perwerde kirin ku wan fêrî jiyana komînal, hevpar û hezkirinê dike, bi vî rengî caivaka xwe bi rêxistin dike. Ji ber ku Rêber apo girîngî daye perwerdê, dema ku mirov xwe û civaka xwe bide avakirn, pêwîst e destpêkê xwe perwerde bike da ku karî be civaka xwe qezanc bike.”

**‘Girîngiya perwerdeyê’**

Leyla Gilo diyar kir ku ew taybetî didin perwerdeyên jin û wiha pêde çû: “Yek ji girantirîn mijarên di perwerdeyên komînên me de kesayeta jin e, em di vê mijarê de jinan kom dikin û ji wan re behsa kesayeta jina azad ku hêza wê ya zanîn û pêşengtiyê li pêş be. Her wiha em dixwazin jin fêr bikin ku ne tenê jin dikare civakê birêve bibe, bila her kes bizanibe ku jin dikare jiyanek bixwe û bêyê ku zilam alîkariya wê bike avabike. Giringtirîn tişta ku jin karîbû bike parastine. Jin di aliyê parastinê de xwe pir pêşxist. Pêwîst e jin di her aliyê civakê de were qebûl kirin ji ber jin ya herî zêde dikare civakê bibe ser aliyê xwe û bibe berbisiyar. Jin her dem pêwîstiya wê bi perwerdeyan heye ji ber ku Rêber Apo dibêje mirov çiqas zanebe her pêwîstiya wî/wê bi pêşektinê heye. Ji ber ku her dem rewş tê guhertin û daxwaziya mirov bi naskirinê heye. Em dixwazin her dem jin di nav guhertin û veguhertinê de be, da ku xwe di nav siyasetê de kûr bike û li hember hemû êrişan bibe bersivekî mezin.”

## Gotina Dawî



### Kurdan dest ji prensîpên xwe bernedan!

Mihemed Seydi

Kurd ne Kurdê berê ne û êdî wê nebin leşkerê tu aliyan. Kurd ne bê dostin û xwedî siyaseteke xurtin ku dikarin bi hemû aliyan re di nava peywendiyan de bin. Kurd, ne tenê bi dostan re, dikarin ji bo xwe biparêzin, bi dijminê xwe re danûstandinê bikin û li ser Maseyekê rûnin. Kurd dest ji ya xwe bernadin û xedefa wan jî di vê serdemê de zelal e. Ev gotin, li ser zimanê her Kurdekî ye, dema ku yek jê dipirse: gelo ew ê Kurd bibin xwedî destkeftî?

Min xwest bi van çend hevokan dest bi vê nivîsê bikim ku gelek caran tê ser ziman. Kurd çi li Rojava û çi jî li Bakur û çi li Başûr û çi jî li Rojhilat, ne ew in ku di sedsala derbasbûyî de dibûn leşker ji yên din re. Ev zêdetirî 10 salaye, hemû aliyên di nava aloziya Sûriyê de destê wan heye, xwestin Kurdan ji xwe re bikin leşker.

Di sêrî de dewleta Tirk ku xwest Kurdan wekî Lîwayên Hemîdî di dema avakirina komara Tirk de çawa bi kar anîn, niha jî bi kar bîne. Xwest wan bike beşek ji komên çekdar ên qaşo li dijî rêjîmê şer dikin lê dema Kurdan qebûl nekir, vê carê xwest bi DAIŞ’ê wan tune bike. Ew jî nebû, vê carê di bin navê ku Kurd dixwazin Sûriyê parçe bikin, kom li dijî wan xistin tevgerê. Ji ber negihîşt bighêje encamê, vê carê dewleta Tirk xwest bi rêjîma Baas re li hev bike da li dijî Kurdan şerekî bidin destpêkirin.

Di dawiya sala 2024’an de Ku hêzên HTŞ berê xwe didan herêmên Rêjîmê, dewleta Tirk xwest bike firsend û di vê navberê de berê komên xwe da bendava Tişrînê da ku hinek herêmên QSD’ê diparêz dagirbike. Lê di vê de jî negihişt encamê û Kurd û hêza QSD’ê dest ji Perensîpên xwe bernedа û ji daxwazên xwe nehat xwarê.

Tevî ku dewletên destwerdan di karûbarên Sûriyê de dikirin, alî guhertin û berjiwendiyên wan hatin dijberî hev, lê Kurd bi yek mesafe ji hemû aliyan sekinîn. Çi erebistana Siudiyê û çi jî Amerîka çi Rûsiya û çi jî Îran. bi van hemû welatan re tu dijminatî nekir û heta dema ku dewlata Tirk rasterast êrişî Kurdan nekir, bi wê re jî tu dijminatî nekir. Lewma îro jî dikare ji hemû aliyan re bibêje, ger hûn çareseriyê dixwazin, em jî dikarin bibin beşek jê û destek bikin. Lema îro dema kîjan alî li ser Sûriyê û pêşeroja wê diaxive, nikare Kurdan, QSD’ê û Rêveberiya Xweser neyîne ser ziman.

Li aliyê din, dewleta Tirk ji vê siyaseta Kurdan gelekî acize û nema zanê çawa wan qels bike. Piştî hemû planên wê têk çûn, vê carê mijara çekdanînê zêde xist rojevê û xwest bi riya desthilata HTŞ’ê ya li Şamê zextê bike. Lê wer xuyaye, Ehmed El-Şerie serokê desthilata veguhêz ya Şamê, qasî ku xwe dide aliyê Erebistana Sûidiyê, baweriya xwe bi Turkiyê nayîne. Ji ber dewleta Tirk jî ev yek ferq kiriye, Wezîrê Ehmed El-Şerie, Esed El-Şîbanî kiriye zilamê xwe û ne dûre bi riya wî derbekê lê bixe. Lewma piştî civîna destpêka Cotmehê li Şamê di navbera Şandeya QSD û desthilata veguhêz de, Şîbanî yekser berê xwe da Turkiyê da agahî bide serokên xwe yên li Enqerê ka çi hatiye axaftin. Her wiha niha jî dixwazine Idlibê ji destê wî derbixin û çekdarên biyanî li dijî Şerie bixin tevgerê. Ji ber Ehmed El-Şerie ketiye ferqa vê rewşê, li gorî hin çavkaniyan, wî xwestiye ew û Mezlûm Ebdî bi tenê bicivin û hin hurgiliyan bê amadebûna kesên din nîqaş bikin.

Ji ber Ehmed El-Şerie jî dizane ku Kurd xwedî aqilmendiyê ne, dixwaze pişta xwe bispêre wan û hevalbendyê çêbike. Ji ber Kurd ne ji perensipên xwe dadikevin û ne jî mafê tu kesî bin pê dikin.

## Sudoku:Pirs 62

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | | | 2 | | | 8 | 9 |
| | | | | | 5 | | 7 | |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | | | 2 | |
| | | | | | 2 | | | |
| 7 | | 9 | | 6 | | 2 | | 5 |
| | | | 5 | | | | | |
| | 2 | | | 8 | 7 | 1 | 5 | 6 |
| | 3 | | 1 | | | | | |
| 1 | 5 | | | 9 | | | | 7 |

## Sudoku: Bersiv 61

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 8 | 3 | 2 | 1 | 6 | 5 | 9 | 4 |
| 2 | 1 | 4 | 9 | 5 | 8 | 3 | 7 | 6 |
| 6 | 9 | 5 | 7 | 4 | 3 | 2 | 8 | 1 |
| 9 | 2 | 7 | 6 | 8 | 1 | 4 | 3 | 5 |
| 1 | 3 | 6 | 5 | 7 | 4 | 9 | 2 | 8 |
| 5 | 4 | 8 | 3 | 2 | 9 | 1 | 6 | 7 |
| 4 | 5 | 2 | 8 | 3 | 7 | 6 | 1 | 9 |
| 3 | 7 | 9 | 1 | 6 | 5 | 8 | 4 | 2 |
| 8 | 6 | 1 | 4 | 9 | 2 | 7 | 5 | 3 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Girê li pişt heçik ket:**
- Em bi ser ketin; em gihatin armanca xwe; êdî ti xeter neman.

**Helal be ji te re:**
- Dema yek di tiştekî de bi ser dikeve hingê jê re dibêjin.

**Îmana wî leqand:**
- Pê karî.

**Lingê qijikê şkand:**
- Bi ser ket; êdî dikare bike; ya zehmet kir ya hêsan ma.

**Li perestû (perê stû) xist:**
- Derba wî cih girt; ji karê xwe fêm dike; karê wî baş bi rê ve çû; tişta ku dixwest bi dest xist; plana wî bi ser ket.

**Me hil da:**
- Em bi ser ketin
(Hil navê lîstikekê ye)

**Mijik jê bir/mijik jê birin:**
- Lê xist; lê da; sekvanekî baş e.

Pêşî ne bi rîşî ne, paşî ne çi bawî ne:
- Kesên li pêş bi ser dikevin.

**Rûvî di xapan de şêr e:**
- Ew kes jîr e ku di pîşeyê xwe de serkeftî be.

**Serî girt:**
- Pêk hat; çêbû; meşiya.

**Serî jê stand:**
- Jê borî; li hemberî wî bi ser ket; kariyê.

**Serê xwe ji kerê deranî:**
- Bi ser ket; xwe rizgar kir.
(Berê di lîstika zarokan de dihat gotin.

**Tirşika wî derxist:**
- Pê karî.

**Toz jê bir/toz jê rakir:**
- Lê da; lê xist.

**LI SER MEZINBÛN Û GIHÎŞTINÊ**

**Av lê geriyaye/av tê geriyaye::**
- Bûye xort; gihatiye.

**Bi fira ketine:**
- Mezin bûne; êdî pêwîstiya wan bi dêbavên wan nîne.

**Bi fira xistin:**
- Êdî zarokên wî dikarin xwe xwedî bikin, êdî pêwîstiya wan bi dibavên wan nîne.

**Cihê xwe dadigire:**
- Biqelafet e; biheybet e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Xwişk û biratiya gelan di bin gef û êrişan de ne pêkan e!



Dewleta Tirk her dem behsa xwişk û biratiyê dike, lê li dijî çareseriyê û demokratîkbûnê derdikeve û gefan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Herwiha ne mûmkin e xwişk û biratiya gelan di bin gef û êrişan de pêk bê, lê bi wekhevî û yekîtiya gelan pêkan e.**R-4**

## Reqa; ji tarîtiyê ber bi wekhevî û hevgirtina gelan ve

Piştî berxwedana mezin a 134 rojan, di 20'ê Cotmeha 2017'an de bajarê Reqayê yê ku çeteyên DAIŞ'ê weke peytext ji xwe re bi nav kirbûn, ji aliyê şervanên QSD'ê û YPJ'ê ve hate rizgarkirin. Reqa ku DAIŞ'ê kiribû navenda sûcên dijmirovî, piştî rizgarkirinê bû bajarê xwişk û biratiya gelan.**R-6**







## ‘Bi Şerê Gelê Şoreşgerî em ê serkeftinê misoger bikin’


Rêvebera Meclisa Malbatên Şehîdan Şemsîxan Gulo tekez kir ku bi Şerê Gelê Şoreşgerî wan serkeftin misoger kir û got, “Di şoreşê de her kesî xwe berpirsyarê vê xakê dît, lewma bi yekbûn û hevgirtina gelan îro em destkeftiyên serkeftina şoreşê dijîn."**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1317 | 19-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# ROJNAMEGERIYA TIRKIYÊ BÛYE AMÛRA DESTÊ DESTHILATDARIYÊ

Rojnamevan Serdar Altan da zanîn ku di serdema desthilata AKP'ê de ruhê çapemeniyê hate kuştin, tu têkiliya çapemeniyê bi gel û heqîqetê re nema û got, “Dema AKP'ê bû desthilat, ev car bû çapemeniya alîgirê AKP'ê û dîsa dijberiya Tevgera Azadiyê û aliyên demokrat û aştîxwaz kirin."**R-5**





## Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermend Cemîle Pîrê bi dengekî bêhempa tê nasîn, xwedan pêlpêlokên taybete ku di nav hunermendên jinên Kurd de mîna wê pir kêm têne dîtin.**R-7**



### Siyasetek lewitî dimeşe
Ahmet Aktaş R-4



### Ji bo mubtelayên hubrê
Remezan Olçen R-7

## Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên bihîstbarî

Di pêşveçûna qada ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê de, bi hemdemiya rêveçûna xebatên nivîskî û dîtbarî de, xebatê bihîstbarî jî bi pêş ket. Ev yek di 9 radyoyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weşanê dikin de, tê birêvebirin.**R-3**

# ‘Bi Şerê Gelê Şoreşgerî em ê serkeftinê misoger bikin’

Rêvebera Meclisa Malbatên Şehîdan Şemsîxan Gulo tekez kir ku bi Şerê Gelê Şoreşgerî wan serkeftin misoger kir û got, “Di şoreşê de her kesî xwe berpirsyarê vê xakê dît, lewma bi yekbûn û hevgirtina gelan îro em destkeftiyên serkeftina şoreşê dijîn.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Şerê Gelê Şoreşgerî stratejiyeke ku xwedispêre beşdariya berfireh a gel di têkoşîna siyasî û leşkerî ji bo parastina mafan û pêkanîna guhertinên civakî û siyasî. Bi salan e hebûn û rûmeta gelê Kurd ji jêr tehdîda konsepta înkar û tinekirinê de ye. Dijmin bi rê û rêbazên cûda dixwaze xeta berxwedanê ya gel lawaz bike, da ku konsepta xwe ya qirkirinê hêsantir pêk bîne. Li dijî van êrişan hemûyan, xweparastin û israrkirina ji bo parastina hebûna xwe ji her tiştî giringtir e. Di cîhanê de mafê her zindiyekî heye ku xwe biparêze, em jî weke zindiyeke xwedî vîn divê bi bîr û baweriyeke mezin xwe biparêzin.

Gelê ku hebûna xwe neparêze herikîna jiyana wî bê wate dibe û ji civaka xwezayî ya civaka exlaqî û polîtîk bêpar dimîne, bi vî awayî nikare xwe li ser piyan bigire. Lewma pêwîst e mirov Şerê Gel yê Şoreşgerî ku tê wateya şerê hebûnê, bi azadiyê misoger bike. Dijminê me her roj û her kêlî dixwaze qira Kurd bîne û tevahî êrişên xwe jî di çarçoveya vê konseptê de pêk tîne, li dijî vê konsepta qirkirinê şerê gel, şerekî mafdar e. Di vir de felsefeya Rêber Apo a dibêje; “Eger hêza me têra tevahiya cîhanê bike jî em ê êrişî kesî nekin, lê eger tevahiya cîhan bibe yek û ber me de were jî, em ê tu carî dest ji parastina xwe ya rewa bernedin.”

Armanca Şerê Gelê Şoreşgerî li hemberî êrişên giştî xweparastina gelerî ye. Ev yek ne şerekî taktîkî û



demkî, lê şerekî stratejîk, jiyanî û pir alî ye. Bi vê stratejiyê re armanc ew e ku pergala faşîst û desthilatdar bê paş de xistin û tinekirin.

**Şerê Gelê Şoreşgerî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê**

Îro li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji her demê zêdetir pêwîst e ku em li gorî istratîjiya Şerê Gelê Şoreşgerî tev bigerin. Ji ber ku em di qûnaxeke diyarkirina çarenûsî derbas dibin, dijmin ji her aliyan êrişan dike, çi di rêya çekan an jî di rêya şerê taybet ku di destpêkê civakê ji hev bixe, piştre bi hêsanî bi çekan êriş bike. Berî niha jî di destpêka Şoreşa Rojava gelê herêmê xwe kiribûn yek û li dijî çeteyên DAIŞ’ê şer kirin, ji zarok heya mezinan bi keç û xortan tevlî şerê hebûnê bûn. Di vê dema hestiyar de pêwîst e her ferdekî di civakê de xwe li hemberî parastinê berpirsyar bibîne. Parastin tenê nakeve li ser milên hêzên leşkerî, lê divê her kesê di civakê de jî bi erka parastinê rabe. Herwiha divê her ferdeke xwe perwerde bike, çi di mile leşkerî an jî di mile hişmendiyê de xwe zane bike. Bi vî ruhî encex dagirkerî û dijmin têk biçe.

Girdayî vê mijarê Rêvebera Saziya Malbatên Şehîdan Şemsîxan Gulo ji Rojnameya me re axivî û tecrûbeya xwe di nava şoreşa Rojava de anî ziman.

Rêvebera Saziya Malbatên Şehîdan Şemsîxan Gulo di destpêka axaftina xwe de tekez kir ku şoreşa Rojava ji destpêka rûdana wê li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî hat meşandin û wiha dewam kir: “Her ferdekî di nava civakê de xwe berpirsyarê vê şoreşê dît, hemû kes di nava liv û tevgerê de bûn û li ser piya bûn da ku serkeftinê bidestbixin û dijmin têk bibin.

Şemsîxan Gulo da zanîn ku ji bo parastina hebûna herêmê gel Şerê gelê Şoreşgerî hilbjart û wiha got: “Di çarçoveya Şerê Gelê Şoreşgerî de me weke malbata 5 kes tevlî şerê li Serêkaniyê bûn dema yekem car DAIŞ’ê êriş kir, ji ber ku xweparastin mafekî xwezayî ye weke gelê herêmê ji bo karibin hebûn û azadiya xwe biparêzin yekane Şerê Gelê Şoreşgerî me hilbijart. Moralê me pir xurt bû û encama têkoşîn û berxwedana me jî mezintir bû, di encama wê de dijmin têk çû û serkeftin hat qezenckirin. Em ne poşmanin tevî ku bi hezaran şehîd jî me danîn, lê rakirina zilmê li ser gel kêfxweşiyê ji xemgîniyê zêdetir dike. Bi hezaran malbat wekî me tevlî berxwedana li dijî zilm û zordariyê bûn, bi saya keç û xortê me di heman demê de bi hevkariya civakê û her ferdeke ku xwe berpirsyarê vê xakê dît bi yek destî dijminê hov wekî DAIŞ’ê me da şikenandin.”

**‘Şerê Gelê Şoreşgerî li Çiyayê Kurdistanê destpê kir’**

Şemsîxan diyar kir ku şerê gelê şoreşgerî ji çiyayê Kurdistanê destpê kir û wiha dewam kir: “Şerê gelê şoreşgerî ji Çiyayê Kutrdistan gihaşt Rojavayê Kurdistanê û di oxira doza Kurdî bi hezaran keç û xortên me şehîd ketin di tevgera azadiyê de, bêyî tu muqabil tenê rahiştin çek li ser milan û armanc azadî bû. Li Rojava jî civaka me ev yek da meşandina di destpêka şoreşê de, tenê armanc rizgarkirina civakê ji hêzên tarî bû, êdî ferdên di civakê de bi hev re şer kirin û alîkarî dan hev di hemû milan de. Bi avabûna sazî û rêveberiyan gelek guhertin çêbûn gelek ferd êdî bi dirav kar kirin di heman demê de gelek malbat û kesayet hîn jî bi dilsozî xebata xwe berdewam dikin, bi îrade, bawerî û bi fikir û felsefeya Rêber Apo têkoşîna xwe didomînin.”

**Rola jinê di şerê gelê şoreşgerî de**

Şemsîxan Gulo tekez kir ku jinê di şoreşa Rojava de li gorî îstratîjiya şerê gelê şoreşgerî roleke mezin lîst û wiha berdewam kir: “Jinên Kurd bûn sembol û mînak ji tevahî jinên cîhanê re, ji ber ku berxwedaniyeke mezin kirin di şerê li dijî çeteyên DAIŞ’ê de, di heman demê de di hemû milên jiyanî cihê xwe girt, di astên dîblomasî, siyasî, civakî û leşkerî, heta jinên bi temen mezin di şer de rol dan meşandin bi pêşkêşkirina alîkariyê, rêxistinkirinê, tevlîbûna meşên piştgiriyê û amadekirina xwarinê ji bo şervanan. Jinên kurd bûn îlham ji bo jinên pêkhateyên dîtir da ku ew jî tevlî vê berxwedanê bibin û roleke wan jî hebe di parstina rûmet û xaka xwe de. Jin di şoreşê de xwedî li xwe, maf û xaka xwe derket. Dema ku jin tevlî çi şoreşan bibe nemumkine ku ew şoreş bin bikeve.

Bi vî awayê hevkariyê û li gorî Şerê Gelê Şoreşgerî me dengê şoreşa xwe gihand cîhanê, ku bi yekbûna civakê bi hemû katagoroyên wê beşdarî şoreşê bûn, encama wê jî îro em destkeftiyên serkeftinê dijîn.”

Di dawî de Rêvebera Meclisa Malbatên Şehîdan Şemsîxan Gulo tekezî li ser pêwistiya perwerdeyê kir û wiha gotina xwe qedand: “Gelê Kurd bi hezarê salan di bin qirkirin, êriş û dagirkeriyê derbas bûye di heman demê de dagirkeran dixwestin ku nasname, ziman û çanda Kurdî îmha bikin, lewma ji her demê zêdetir îro hewcdarî bi perwerdeyan heye, perwerdeyên di aliyê hişmendî û fikir de, çawa her ferdek karibe xwe biparêze û lîstokên şerê taybet bizanibe û li dijî wê bisekine. Ji ber ku dijmin dixwazê zêdetir bi şêwazê şerê taybet gel û civakê bixapîne bi taybet ciwanan. Divê em hişyarbin ji van lîstokan, her malbatek dikare xwe biparêze, her ciwanek dikare fêrî xweparastinê bibe û di aliyê hişmendî de xwe zane bike. Bi hev re ancex em dikarin serkeftinê bidest bixin.”

# ‘Li hember zihniyeta HTŞ’ê, lidarxistina kampanyayan girîng e’

**Zana Roj/ Qamişlo**

**Endama Meclisa Jin a PYD’ê yê herêma Cizîrê Hayistan Hesen da zanîn ku 6’emîn Kampanya bi armanca tundiya li ser jin, azadiya fîzîkî a Rêber Apo û dengvedana şoreşa jin li hember zihniyeta ku di Sûriyê de tê birêvebirin; hatiye destpêkirin.**

Di 8’ê Cotmehê de Meclisa Jin a PYD’ê bi beşdarbûna girseya jin ji hemû tevger û saziyên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampaniya xwe a 6’emîn di bin dirûşmeya “Ber bi Avakirina Sûriyayek Demokratîk ve bi Pêşengntiya Jina Azad” ragihad. Têkildarî vê kampaniyê Endama Meclisa Jin a PYD’ê ya herêma Cizîrê Hayistan Hesen ji Rojnameya me re axivî.

**Naveroka Kampanyayê**

Hayistan derbarê kampanyayê de wiha axivî: “Li gor herikîna pêvajoyê her dem kampaniya ji aliyê Meclisa Jin a PYD’ê ve tên destpêkirin, Ev jî kampaniya 6’emîne ku ji bo tundiya li ser jin, her wiha azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û komploya ku hatiye meşandine. Her wiha dengvedana Şoreşa Rojava a ku bi pêşengtiya jin hatiye destpêkirin ava bikin. Wê di vê çarçoveyê de rêzeçalakiyên me yên taybet hebin. Ji wê zêdetir wê çalakiyên nîtalîk bi komxebat û panel bên lidarxistin. ev kampanya wê heyanî 2 heyvan dirêj bike. Bi serpereştiya Meclisa Jin a PYD’ê hemû jinên di nava sazî, partî, tevger û rêxistinana de cihê xwe tê de digrin. Her wiha jinên ji civakê. Bi vê kampanyayê re wê danûstandin û tensîq bi hemû saziyên jin re hebe, her wiha bi jinên ciwan re jî”.

**‘Li hember kiryarên li ser jin; şerê zihnî pêş bixin û bibin destek ji jinên Sûriyê re’**

Hayistan di berdewamiya axaftina xwe de da zanîn ku li hember rewşa Sûriyê bi taybet di dema hikumeta HTŞ’ê ya Colanî de, pêwîstî bi van kampanyayan heye û wiha got: “Hikumeta heyî a Sûriyê rola jina pêşeng ji her qadê tune dihesibîne û tu garantiyê nade jinê. Ev yek ji rengê tundiya ku li ser îradeya jinê tê meşandine. Bi taybet di aliyê ku jin dibe pêşenga şoreşan, HTŞ’ê jinê ji biçûktirîn mafê wê bê par dike. Ji lewra Projeya Netewa Demokratîk weke dijber û hêza tunekirina xwe dibînin. Ê li hember van zihniyetan divê em weke tevger, sazî û partiyên jin hebûna xwe zêdetir diyarker bikin, li hember wan şerê zihnî pêş bixin û bibin destek ji jinên Sûriyê. Ji lewra hebûna van kampanyayan gelek girînge. Çalakiyên ku di van çarçoveyan de bêne lidarxistin wê girêng û bi encam bin”.

**Her wiha li gorî bernameya ku hatiye eşkerekirin ev çalakiyên ku wê bêne lidarxistin:**

Em ê rêzepanelên gelemperî li bajarê kantona Cezîrê bi sernavên “Malbata Demokratîk” “Rûbirûbûna bi Tundûtûjiyê re”, bi armanca çandina van têgehan di hişmendiya civakê de li dar bixin. Herwiha du forman li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê li her du kantonên Cezîrê û




Reqayê li dar bixin. Di heman demê de rêzecivînên û panelên hevrêzîyê bi saziyên Rêveberiya Xweser re, bi hevkariya Koordînasiyona Jin di rêveberiyê de bidin lidarxisitn. Hem jî çend atolyeyên perwerdehî û amedekirinê çêbikin. Li hêleke din ji bo bîranîna şehîd Şîlan li bajarên Kobanê û Qamîşlo bi rêya şevbuhêrkên çand û hunerî yên ku li gorî meqam û têkoşîna wê li dar bixin.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Cemîle Pîrê

“Çemeke zuha nabe û ronahiyeke venamire”

Stranbêjên jin ên kurd bi dengên xwe, destanên devikî û stranên folklorî parastin ,ku tê de qehremanî, evîn û hesret û bêrîkirin hate îfadekirin, ew bûn parastvanên bîr û afirînerên hestên civakî, ziman ji wendabûnê parastin û kelepûr bi şêweyên nû vejandin û zindî kirin, wan stranbêjiya Kurdî kir qîrîna hebûnê , bîranînek zindî û pirek ku paşerojê bi pêşerojê ve girêdide. Rola wan tenê bi dubarekirinê sînordar nema ,lê wan jinan awaz nû kirin û amûrên nûjen daxistin, di gel parastina ruhê folklorîk, wan çarçoveyek navneteweyî dan strana kurdî bê ku reseniya xwe ji dest bide.

Di nav van dengan de hunermend Cemîle Pîrê diyar dike, ku hunera xwe kir bin xizmeta gelê xwe û doza wê de, wê stranên xwe kir nivîsarek ku dîroka jina kurd û berxwedana wê ,û têkoşîna gelê xwe ji bo azadî û rûmetê vedigot,kir dengek çandî û giyanî ku hêvîyê dide û nasname di parêze .

Dengê wê ji dilê Cezîra Sûriyê bilind bû, bi henasa bayê Çiyayê Toros û govenda sinebilên genim di biharê de, da ku bibe stêrka ronak di asîmanê hunera kurdî de, hunermendeka ku hevrêziyê dike di navbera stranên folklorîk û hemdem de, di navbera reseniya kelepûr û ruhê nûjen de , da ku bibê hilgira nasnameya kurdî û bîrekî zindî ji bo gelê xwe.

Ji zarokiya xwe ve, wê guhdariya dengên şehsiwarên stranbêjiya kurdî û erebî dikir, di giyanê wê de awazên huner û nebeza kelepûr diherikîn, bi erebî û kurdî distirand û stranên wê bûn nivîsarek zindî ji bo jina kurd û têkoşîna gelê wê ji bo azadî û rûmetê û dengek ku rêyên xweparêzî û hêviyê ronahî dike û bîrdankê jibîrbûnê diparêze, dengek ku te di ruhê stranê de bilind dike, hunermendeke xwedan gewriyek zêrîne di medyayê de zilim lê hatiye kirin , di gel ewqas qîmeta huneriya wê ya bilind , ne tenê di stranbêjiyê de , lê di hemû warên afrîneriyê de jî, ew jî hunermenda hêja Cemîle pîrê ye .

Cemîle pîrê di sala 1972’an de ji dayîk û bavek kurd (Mihemed Şerîf û Mencê) hatiye dinyayê li gundê Dekşûriyê ya li devera Dêrikê, ew cihê ku bû û hîn jî maye dergûşek ji bo hevgirtina olên asîmanî di seranserê dîrokê de û navendek bo çand û hunera kurdî, û wargehek bo stranbêj û hunermendên wekî (Mihemed Tayîb Tahir, Ebdû Elanê, û Cemal Sa’dûn), û yên din ku bi dengên xwe yên xweş û zelal asîmanê hunera kurdî ronahî kirin, piştre jî , wê rêya xwe li ser sehneyên şano û salonên stranbêjiyê ronahî kir, da ku bibe balyoza Kurdistanê bi dengê xwe ya bedew li Ewropayê.

Hunermend Cemîle Pîrê zarokiya xwe li nav gundê Dekşûriya a keskîn û aram de derbas kir, ku dikeve di navbera Bakur û Rojava de, li wir, ku sura bayê di nav deştên wê re derbas dibe, bênxweşiya xakê û ruhê xwezayê bi xwe re dianî ,li wir ew zû têgihişt ku xwezaya ku li derdora wê ew bû dibistana wê ya yekem a huner û stranbêjiyê , wê ji sîrûdên jinan di zeviyan de , û ji stranên palevanan di demsalan de, yekem taybetmendiyên hunera xwe wergirt , herwiha awazên bilûrên şivanan û ringeringa zinglên beran û karikan di çîmen û bênderan de, ramanên xweparêzîyê di wijdana wê de hûnandin, da ku Xweza bi deng û wateyên xwe bibe yekem mamoste a ku kesayetiya wê ya hunerî ava kir, wê di xumxuma ava robaran de ritmek didît û ji pirepira baskên Tiloran de awazek vehûnand wekî ku ew simfoniyek ji bo jiyana xwe ya yekem ji tevlihevîyên dengên xwezayê diafirîne.

Wê bi rêya radyoyekî piçûk di gundê xwe de guhdarî dengên şehsiwarên stranên Kurdî û Erebî dikir; wekî (Mihemed Arîf Cezrawî, Tehsîn Teha, Ayşe Şan, Ûm Kelsûm, Ferîd El-Etraş û Feyroz), wan dengan şopek kûr di wijdana wê de hişt û di giyanê wê de hezkirina muzîk û nebeza kelepûra kurdî çand.

Û bi veguhastina malbatê bo bajarê Qamişlo, Cemîle Pîrê xwendina xwe ya seretayî, amadahî û navîn li dibistanê we qedand, li wir, rêwîtiya pêşxistina hinêra xwe di jîngehek şaristanî ya têkildar bi çand û huner de berdewam kir , ku tije bû bi dengên pêşengên stranbêjên Kurd wekî (Mihemed Şêxo, Saîd Yûsiv, Aram Tîgran, û Mihemed Elî Şaker, Salah Resûl … hwd.).

Ew deng û jîngeha çandî xakek dewlemend bûn , ku li wir nasnameya xwe ya hunerî pêşbêxe, û paşê bûye neynikek ji bo nasnameya Kurdî û bîranînek zindî ji bo gelê xwe.

Hewesa wê ya hunerî û hezkirina wê ji bo stran û muzîkê despêkir di temenek piçûk de, di qonaxa seretayî de jêhatîbûna wê xuyakir bi beşdariyên wê di stranbêjiya dibistanî de bi zimanê erebî, di temenê 11 salî de, ew hilkişiya ser sahneya Navenda Çandî ya Qamişlo, da ku strana “Beyne Rita û Eyûnî Binduqiye “ ya hunermend Marsêl Xelîfe bixwîne..

Piştî ku wê li ser asta parêzgeha Hesekê xelata yekemîn wergirt , wê bûyerê pênasînek zû bi şiyana wê ya dengbêjî û cûdahiya wê ya hunerî kir, piştre wê dest bi stranbêjiyê kir bi beşdarbûna di nav komên folklorîk yên Kurdî de , di dema Cejnên Newrozan de , wê yekê girêdana wê bi kelepûra Kurdî û strana neteweyî ve kûr kir, di encama çalakiyên xwe yên hunerî û çandî di pîrozbahiyên neteweyî de bû sedema dûrxistina wê ji Peymangeha Amadekirina Mamosteyan ,ev yeke eşkere dike ku tecrûbeya wê ya hunerî bi dimeneya neteweyî û têkoşînê ve girêdayî bû.

Hunermend Cemîle Pîrê di sala 1992’an de zewicîye û dayîka sê ciwana ye û di sala 2011’an de berê xwe da Ewropa, li pey xwe hişt xwedan û bîranînên zaroktiya xwe,lê belê, xerîbî nebû asteng li pêşiya kariyera wê ya çandî û hunerî , lê bû sedemek ji bo xurtkirina girêdana wê bi zimanê kurdî û nasnameya neteweyî ve.

Wê pêşkêşkirina stranên neteweyî berdewam kir û girêdana xwe bi stranên folklorî ên Kurdî ên resen ve zêdetir kir , di gel parastina kokên nasnameya wê ya hunerî tevî ewqas dûratî û wê tekez kir ku hunera kurdî dikare li berxwebide û xwe nû bike li nav çarçoveya xerîbiyê de.

Di dema rêwîtiya xwe ya hunerî de, hunermend Cemîle Pîrê di sala 2001’an de albûmeka muzîkî weşand, ku tê de deh stranên cûrbecûr hebûn di navbera , neteweyî, folklorîk û romantîk de ,ew dengvedanek bû firehîya ezmûna wê ya hunerî û hêza afirandina wê di îfade kirina hemî aliyên mirovî û neteweyî de .

Di vê mijarê de dayîna wê ne rawestiya, ji bilî vê albûmê ,wê karîyera xwe domand, û gelek stranên takekesî “singel” ên bi şêwe yê neteweyî belavkir, ji ber ku guherîn û bûyerên siyasî yên li Kurdistanê rûdidan hestên wê yên kûr di livandin , wê jî bi hunerek rast bersiv dida wan, ku tê de nebezên( jenên) dilê wê vedighurîn peyv û awazan û dengek tije ji his û pabendiya neteweyî.

Di nav karên wê yên herî berbiçav de , ku dengvedanek berfireh di nav gelê kurde dane:

1-Roj baş Efrîna min

2-Ez Şengal im

3-Kobanê

4-Bist û yekê Adarê

5-Azadî

6-Bûk û zava

Hunermend Cemîle Pîrê di dema rêwîtiya xwe ya hunerî de beşdarî gelek şevbuhêrkên stranbêjiyî, pîrozbahiyên neteweyî, helkeftên çandî û festîvalên mezin yên hunerî li Ewropa bûye,

dengê wê jî di Cejnên Newrozan de hebûneka wê ya taybet hebû, ku di hestên kurdî de sembolîzma azadiyê û wateya jiyanê nû dikir.


Herwiha wê li kêleka hunermendên mezin ên kurd wekî (Şivan Perwer, Bîto Can, Xelîl Xemgîn, Diyar Dêrsim, Hesên Şerîf, Sîmar, Brader, Armanc û Xuşnav Têlo )stran digot , da ku tekez bike ku hunera kurdî yek kiyan e, û strana kurdî pirek zindiye ku paşerojê bi dema îroyîn ve girêdide û rê li ber pêşerojê ronî dike.

Hunermend Cemîle Pîrê ezmûna stranên duetan û komalî bi gelek hunermendên navdar ên kurd re digot , vê yekê rolek girîng lîst di rêwîtiya wê ya hunerî û firehkirina asoyên stranên wê de ,ji nav wan hunermendên pêre stran gotîne:

-Şivan Perwer - Lê Cemîla

-Zubêr Salih - Dema baran tê.

-Sîpan Efrînî - Roj baş Efrîna min.



-Sa’dun Kobanî - Pûşmanî

-Şivan Can û Helmet Mîrza - Ez Şengal im

- Bîto Can -Hecî

- Dilo Doxan - Narim Narim.

Van tecrubeyên hevpar rolek girîng lîstin di pêşxistina ruhê hevkarîya hunerî di navbera pêşengên stranbêjiya kurdî de û cureyek cûdahî û kûrahîk bedewî li strana kurdî zêde kirin.

Hunermend Cemîle Pîrê têkiliyên nêzîk û peywendiyên xurt bi komek ji helbestvan û hunermendên Kurd û Ereb re hebû, mîna: Mihemed Elî Şakir, Bîto Can, Ce‘fer Hesin, û Kokeb Hemze, û hwd.

Vê yekê rolek lîst ji bo dewlemendkirina ezmûna wê ya hunerî û xurtkirina hebûna wê di dîmena çandî ya Kurd û Ereban de, û asoyên nû vekir ji bo hevkariya afirînerî ya hevbeş, ku dengvedanek da di kariyera wê ya zengîn û berbiçav de .

Hunermend Cemîle Pîrê bi dengek bêhempa tê nasîn, xwedan pêlpêlokên taybete ku di nav hunermendên jinên kurd de mîna wê pir kêm têne dîtin, ew bi bedewiya astên dengê xwe dilan digire,û birînan sax dike bi xunava wateyên xwe û germiya peyvên xwe û bedewiya hestên xwe.

Ev cudahî di balgîrtiya cureyên medyayê yên cihêreng de xwe nîşan da, wekî ku di van demên dawî de gelek kanalên televîzyonî û malperên elektronîkî bi wê re civîn û hevdîtinên hunerî çêkirin di nav wan de : Stêr TV, Kurdistan TV, Peyv TV, Efrîn One û yên din, da ku ronî bidin ser ezmûna wê ya hunerî ya dewlemend û dîtina wê li ser afrînerî û muzîkeya kurdî.

Di dema kariyera xwe ya hunerî de, hunermend Cemîle Pîrê bi dehan stranên neteweyî û romantîkî pêşkêş kir, û wê bi dengê xwe û bi awazên xwe tîrêjên ronahiyê li asîmanê hunera kurdî vehûnand.

Wê ji bo xakê, welat, evînê, jinê, azadî û şoreşgeran distrand, û stranên folklorîk nû kir da ku rûhê wan di dilê nifşan de bilive.

Bi dengê xwe yên xweş û şêrîn û rewaha xwe ya tije ji rastî, muzîka wê bû neynikek ji nasnameya kurdî û bîranîna zindî ya gelê wê re, ku çîrokên têkoşîn, tevlêbûn û hêviyê vedibêje , heya vê rojê, ew hîn jî di xurtbûna dayîna xwe de,diyare wekî stêrkek geş li asîmanê afirîneriyê ye, di her awazê de peyamên hunerê yên kûr hildigire, û bandorek bêhempa li ser wijdana hezkerên xwe dihêle.



## Ji bo mubtelayên hubrê

**Remezan Olçen**

Vê heftiyê li Qamişlo pêşangeha pirtûkan heye. Ev dibe 9 sal ku pêşangeh tê çêkirin. Pêşangeha Herekol a Pirtûkan. Pêşangeh li Parka Azadî ya Qamişloyê ye. Ez dibêjim jê nemînin. Her çi kesê xwedan derfet bila biçe pêşangehê. Ew girîng e. Ji ber ku ez jî ji wan mirova me ku bawer dikim ku edebiyat-wêje stargeha dawî ya mirovahiyê ye. Di vê dinyaya ku teknolojî bûye dînê nû, ehlê qelem û hubrê ji me re dibêjin; dinyayeke din heye.

Nivîskar, nivîs û xwendevan elementên sereke yên wêjeyê ne. Nivîskar hema ji xwe re nanivîse. Dibe ku yên wilo dinivîsin hebin. Kafka yek ji wan bû. Ji xwe re dinivîsî, berya rehmet bike ji hevalê xwe re dibêje; dema ez mirim van reşnivîsan bişewitîne. Lê hevalê wî bi ya wî nake. Dibe ku îxaneta hevalê wî di warê exlaqî de pirsgirêkeke mezin be lê ji bo me xwendevanan em spasiya wî dikin. Bi xêra wî em ketin nav mêjî û dilê Kafka. Em bi karekterên wî re di wê cîhana Kafkaesk de geriyan. Edebiyat behsa mirov dike, behsa jiyanê dike û em bi her xwendinê hinekî jî li xwe, li rastiya xwe, li heqîqeta xwe digerin.

Wextê, nivîskarekî gotibû; bi her xwendinê re xwendevan bi nivîskar re dikeve nava sohbetê. Dibe ku beriya bi sedê salan hatibe nivîsandin ew berhem, lê dema dixwînî ew tîp û herf dibin dengê mêjî û dilê nivîskar û tu pê re diaxivî. Îcar pêşangehên pirtûkan derfeteke wisa didin xwendevanan ku bi nivîskaran re jî bên cem hev. Li serhatiya nivîsa wî/wê guhdar bikin. Pirtûk bi nivîskarên xwe li fûarê bi ziman dibe. Dikare biaxive. Heta carna derfet çêdibe, tu ji devê nivîskar bi xwe li beşek pirtûkê guhdar bikî, ji devê wî/ê li helbestekê guhdar bikî. Bixwe tecrûbe bikî bê ka hesteke çawa li wan hevokan bar kiriye û çawa ew hevok digihîjin dengê xwe.

Weşanxane jî giring in helbet. Karê ku dikin, bi xwe dikarin nîşanî xwendevanan bidin. Bi pirtûkên xwe yên kevn û nû li wan dezgehan tu dibî şahidê keda di oxira nivîsê de. Ji ber wê lazim e mirov heqê weşanxaneyan jî teslîmî wan bike û wan pîroz bike. Ji wan hîn bêhtir bixwaze. Hîn bêhtir divê mirov li wan xwedî derkeve. Ew pireya di navbera xwendevanan û nivîskaran de ne. Divê em wê pirê qewîn û zexim bikin. Xwedî li keda wan derkevin. Pêşangehên pirtûkan her timî heyecaneke mezin bi min re çêkirine. Ji ber ku ez li wê derê dikarim bi xwe guherîn û veguherîna ziman û zeman bibînim. Lewre her nivîskar hinek jî berdevkiya dema xwe dike. Nivîskarên berê sedê salan jî wisa bûn yên îro jî. Em binêrin bê ka nivîskar bi çi rengî dibîne hal û ehwalê mirovahiyê, jiyanê, civat û civakê.

Erê me got edebiyat lê li pêşangehan ji xeynî edebiyatê li ser dîrok, li ser civaknasî li ser dernûnî, felsefe û hwd jî berhem hene û mirov dikare li wê cîhanê jî mêze bike. Heta ev keys û derfetê dide me ku em wêjeya ku van beşan hemûyan bi awayekî hembêz dike û wan dîsîplînan bide ber hev jî. Bi hêviya ku ehlê qelem û hubrê zêde bibin Pêşangeha 9’an a Herekol a Pirtûkan xalî nehêlin.

# Reqa; ji tarîtiyê ber bi wekhevî û hevgirtina gelan ve

Piştî berxwedana mezin a 134 rojan, di 20'ê Cotmeha 2017'an de bajarê Reqayê yê ku çeteyên DAIŞ'ê weke peytext ji xwe re bi nav kirbûn, ji aliyê şervanên QSD'ê û YPJ'ê ve hate rizgarkirin. Reqa ku DAIŞ'ê kiribû navenda sûcên dijmirovî, piştî rizgarkirinê bû bajarê xwişk û biratiya gelan.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Reqa yek ji bajarên Sûriyê ye û li ber çemê Feratê hatiye avakirin. Bajarê Reqayê xwedî cihekî stratîjîk û dîrokeke kevnar e. Di heman demê de, Reqa di warê cih de, di tevahiya geliyê Firatê de cihekî stratejîk e, ji ber ku ji hemû aliyan ve xaçerêyekê nîşan dide, li bakur Tirkiye, li başûr Şam, li rojhilat Iraq û li rojava jî Heleb e. Rûbera wê 19 hezar û 600 km2 û bi qasî milyonek kes lê dijîn. Reqa bi şûnwarên xwe yên dîrokî navdar e, girîngtirîn şûnwarên wê jî Keleha Cebar û Qesir Albenat in.

### Serdema tarîtiyê

Piştî destpêkirina kirîza Sûriyê di sala 2011'an de, hejmareke zêde ji gelên Sûriyê ji bo xwe ji agirê şer rizgar bikin, koçberî bajarê Reqayê bûn û piştre bû keleha sereke ya çeteyên ku navê opozisyênê li xwe dikirin û bi rêya wan çeteyên DAIŞ'ê derbasî nav bajarê Reqayê bûn. Di sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê bajar bi tevahî dagir kirin, ji ber ku ew nêzîkî sînorên Iraq û Tirkiyê ye çeteyan Reqa wek paytexta xwe bi nav kirin . Di wan 4 salên ku Reqa di destê DAIŞ'ê de bû, çete ji piraniya welatên cîhanê li wir kom bûn. Di vê demê de, Reqa veguherî navendeke sûcan li dijî gel. DAIŞ'ê hewl da ku bandorê li ser hişmendiya gelê bajar bikin û reşkirinê di navbera pêkhate û eşîran de belav bikin. Herwiha heta di nav endamên heman malbatê de, çanda kuştin û tolhildanê teşwîq kirin.

### QSD'ê hêviya jiyana azad e

Ji ber ku QSD'ê di şerê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê de xwe isbatkir hêzên hevpeymanî yekser bi Hêzên Sûriyeya Demokratîk re hevalbendî avakir. Yekane hêzên ku li hemberî çeteyên DAIŞ'ê derketin û gelek herêm ji destê wan derxistin û rizgar kirin. Ji ber ku QSD'ê ji şervanên Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê û Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê pêk tê û tev jî di şer de xwedî ezmûnên bi salan e. Herwiha ji bo pêşeroja Sûriyeke demokratîk, azad û felsefe netewa demokratîk ji xwe re esas digrin. Ji ber van sedeman hêzên hevpeymanî bi wan re hevalbendî danî û nekarî bi Iraq û Tirkiyê re hevkariyê bike. Ji milekî din ve jî hêzên hevpeymanî gihiştibûn wê baweriyê ku bi tena serê xwe û bê desteka QSD'ê wê nikaribin di şerê li hemberî DAIŞ'ê de serkeftinê bi destê xwe ve bînin. Ji ber ku di şerê li hemberî hemû hêzên çete yên ku êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin û di serî de Cebhet Alnusra û herî dawî jî DAIŞ'ê, QSD'ê xwe isbat kir û karîbû ku baweriya gel, heremê û cîhanê jî qezenc bike. Hêzên Sûriyeya Demokratîk QSD'ê pêngava "Xezeba Firatê" di sala 2016'an de ji bo rizgarkirina bajarê Reqayê destpê kirin û bajar di 17'ê Cotmeha 2017'an de hat rizgarkirin û 20'ê heman mehê rizgarkirina wê hat ragihandin.



### Jin ji tarîtiyê ber bi ronahiyê ve

Çeteyên DAIŞ'ê, bajarê Reqa ji bo xwe, weke paytext, bi nav kiribûn. Çeteyan, bi hezaran jinên bê parastin dîl girtin, kirin qefesan firotin û qetil kirin. DAIŞ'ê bi serdestiya xwe ya ku di bajarê Reqayê de dida meşandin, weke bazara firotina jinan bikar tanî. Ew dîwarên koletiyê ku li derdora civaka Ereb hatibûn hunandin û çerşefên reş ku li rûyê jinan hatibûn pêçandin bi destê şervanên QSD' û YPJ'ê hatin avêtin û şewitandin.
Azadkirina Reqayê ne bi tenê li herêmê, di heman demê de di qada navnetewî de jî di şerê berxwedana gelan de pêngaveke mezin bû. Ev pêngava ku hêza jinan YPJ û Yekîtiya Jinên Şengalê YJŞ ê pêşengî jê re kir, bi rizgarkirina gelê herêmê û jinên Êzidî yên di destê DAIŞ'ê de bi serkeftî bi encam bû. Bi azadiya Reqayê re wê hişmendiya ku jinan tune dihesibîne û wan biçûk dixe hat şikandin û li şûna wê jî hişmendiya civaka azad bi isbatkar hat danîn. Bi rizgarkirinê re jinên bajarê Reqayê ew çerşefên reş bi tilîliyan hatin şewitandin. Herwiha niha bajarê Reqayê bû ye, bajarekî xwişk û biratiya gelan, di heman demê de hemû pêkhate dibin fikirê netewa demokratîk û sîwana Rêveberiya Xweser de xwe birêxistin kirin e.

# Di nav şert û mercên dijwar de 6 sal berxwedanî

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

**Di nava Kampa Serêkaniyê de çîrokên pir bi êş, hêviya vegerê û lehengiyê tên jiyankirin, yek ji wan çîrokan jî çîroka koçberê ji bajarê Serêkaniyê Mihemd Elnehar e ku li hemberî nexweşî, êş û zehmetiyan li ber xwe dide.**

Koçberên Serêkaniyê 6 sal in di bin dibin şert û mercên herî zehmet de berxwedaniyê dikin. Koçber hemû astengî û zehemtiyan bi têkoşîneke mezin derbas dikin û hêviya vegera mal û milkên xwe jiyan dikin. Êş, zor û zehmetiyên ku îro li kampê tên jiyankirin, berpirsyarê wê dagirkeriya Tirk e. Koçberên li kampê ruxmî ku kamp ji xwe re kirine cih û war, lê ew di hêviya vegera bajarê xwe de bi israr in.



### Koçberî dibe sedema gelek êş û azaran

Koçberî dibe sedema gelek êş û azararan ku hem di aliyê piskeolojîk de hem jî di aliyê fîzîkî de li ser mirov bandor dike. Dijminê gelê Kurd her xwestiye bi van polîtîkeyan gelê Kurd bê îrade bihêle. Ji xwe armanca wan ji şerên çekdarî wêdetir, ew e ku aramiya herêmê û îradeya gel pûç bikin. Lê belê ev yek li gor pilanên dijmin tu carî nebû ye, mînaka wê jî berxwedana gelê Serêkaniyê, Girê Spî û Efrînê ye. Di Kampa Waşokanî de li kêlek berxwedana 6 salan gelek çîrokên ku aliyekî ji êş û azaran van kesan vedibêjin hene. Yek ji wan çîrokan jî çîroka kalemêrê 76 salî, Mihmed Elnehar e.

### Mihmed Elnehar li hemberî êş û azaran li ber xwe dide

Mihmed koçberekî ji bajarê Serêkaniyê ye û 6 salin li kampa Waşokanî jiyan dike. Di nava kampê de ew li hemberî nexweşî, êş, zor û zehmetiyan li berxwe dide. Tevê ku ew astengdar e li kampê bi tena xwe dijî.
Rewşa Mihmed Elnehar a tenduristî pir xerabe û pêwîstiya wî bi tedawiya bijîşkî heye. Herwiha ev demeke ew li erdê ye û ji ber nexweşiya lingê xwe nikare tevbiger e. Lê mixabin zarokên wî jî ne serdan û ne pirsa wî dikin.
Mihmed Elnehar li ser rewşa xwe wiha tîne ziman: " Tevgera min zehmet bûye û kursiyek tune ku ez li ser tevbigerim. Ez niha li erdê me û nikarim tevbigerim, lê li hemberî nexweşî û zehmetiyan li ber xwe didim. Xewina min ew ku ez li ser piyan tevbigerim."
Mihmed Elnehar dema ku li bajarê Serêkaniyê bû li ser lingên xwe dimeşiya û tevbigeriya, lê dema ku dewleta Tirk a dagirker sala 2019'an de êrişî Serêkaniyê kir, ji ber êrişên çeteyan koçberî kampa Serêkaniyê bû. Piştî ew derbasî kampa Serêkaniyê bû, piştî demekê êşeke sivik di lingê wî de derket. Lewma ji ber nexweşiya lingê xwe Mihmed çû Şamê, da ku derman ji bo nexweşiya xwe peyda bike. Wî li Şamê du niştegarî ji bo lingê xwe çêkirin û dema vegerê li ser rêbendên hikumeta Sûriyê pereyên wî hatin dizînin. Niha jî



hewcwdariya wî bi niştîgariyeke din heye, lê ji ber nebûna pereyan ew nikare careke din biçe Şamê. Rojane Mihmed Elnehar li xwendekarên dibistanê temaş e dike, mîna ku ew zarokên xwe di hundirê kampê de dibîne. Wî bi dengekî şewat got, "Min zarokên xwe bi êş û azaran mezin kirin, lê tenduristiya min xiyanet kir. Ez ji zarokên xwe peryan naxwazim, lê serdanene wan ji bo min bes e. Kurê min, cîranê min, bêyî ku silavê bide min di ber min re derbas dibe."
Mîna çîroka Mihemed bi sedên çîrokan di kampên koçberan de rojan e tên jiyankirin. Me çîroka wî anî ziman lê gelek çîrokên bi êş veşartî ne, tenê bi vergera li ser ser mal û milkên xwe wê koçber beşek ji êşên xwe ji bîr bikin.



# Li Rojava yekemîn dezgehên ragihandinê yên bihîstbarî

Di pêşveçûna qada ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê de, bi hemdemiya rêveçûna xebatên nivîskî û dîtbarî de, xebatê guhdarbarî jî bi pêş ket. Ev yek di 9 radyoyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weşanê dikin de, tê birêvebirin.

**Navenda Nûçeyan**

Di vê raporê de piştî xebatên ragihandinê yên nivîskî û dîtbarî, em balê dikşînin ser xebatê guhdarbarî. Xebatê radyoyê ji destpêka Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de roleke bingehîn di pêşxistina ragihandina herêmê de lîst. Gelek radyo hatin avakirin lê hêjayî bîrxistinê ye ku Radyoya Cûdî yekemîn radyo bi zimanê Kurdî li Rojavayê Kurdistanê li bajarê Qamişlo hat avakirin, lê ji ber hin şert û mercan radyo hat rawestandin. Herwiha li Efrîn û Serêkaniyê jî hebûn lê ji ber dagirkeriya Tirkiyê mixabin weşana wan hatin seknandin. Niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê 9 radyo bi naverokên zengîn, têr û tijî ku hemû bûyer û geşedanên li herêmê diqewimin dişopînin, hene.

### Radyoya Kobanê 2012

Radyoya Kobanê di 11'ê Mijdara 2012'an de hat vekirin. Piştî radyoya Cûdî, radyo Kobanê a duyemîn di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tê avakirin. Piraniya bernameyên me yên civakî, çandî û kevneşopî ne. Her wiha aliyên jiyanî yên gel û herêmê hemû tên destgirtin. Weşana radyoyê herî zêde bi zimanê Kurdî tê kirin. Di dema şerê DAIŞ'ê 2012'an de roleke radyo a pir girîng hebû, heyanî ku şer ji bajêr ve nêz bû jî lê radyo hê weşana xwe berdewam dikir. Ev yek jî aramiyek di nava gel de ava dikir. Di dema va şerê dawiyê de jî cîhazekî me a radyoyê derveyî bajêr jî hebû, ew ji aliyê dagirkeriyê ve hate hedefgirtin. Heyanê niha jî radyoya me ji aliyê dagirkeriyê ve rastî êrişên elkitronîk tê.

### Radyoya Rojava 2013

Radyoya Rojava di 1'ê Nîsana 2013'an de li Çiyayê Qereçox ê Dêrikê hate damezrandin. Ji destpêkê ve, radyoyê dirûşmeya "Dengê Azadiya Gel" wekî platformek ku îradeya civakê û dengê berxwedanê yê hêzên me yên leşkerî nîşan dide, esas girt.
Radyo li ser van aramancan hate avakirin:
-Medyayeke azad û profesyonel ku rastiyê wekî xwe radigihîne, dûrî zivirandin û propagandeyê.
-Xizmetkirina civakê bi rêya bernameyên perwerdehî, çandî, siyasî û leşkerî, bi taybetî ji bo jin, ciwan, huner û folklora gelên herêmê.
-Pirrengiya zimanî bi rêya weşana bernameyên bi zimanên Kurdî û Erebî, û dengên hemû pêkhateyan, da ku tekez li ser jiyana hevbeş di navbera pêkhateyên herêmê de bê kirin.
-Belgekirina berxwedanî û şerê li hember DAIŞ'ê tê kirin, her wiha veguheztina nûçeyên Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê û YPJ'ê û berxwedaniya ji aliyê şervanan de tê kirin.
Rayoya Orkêş di naveroka weşana xwe de van mijaran digre. Bultenên nûçeyan ên rojane yên ku pêşketinên siyasî û leşkerî vedihewînin. Bernameyên diyalogî bi kesayetên civaka sivîl, şêxên eşîran, rewşenbîr, siyasetmedar û personelên leşkerî re. Bernameyên ciwanan ên ku mijarên rêxistinî, serwextbyî û perwerdehiyê vedikolin. Bernameyên taybet yên jin ku tê de xebat, têkoşîn û hebûna wê di civakê de digre dest. Beşên çandî û hunerî yên ku mîrata Kurd, Ereb, Suryanî û Ermenî vejîn dike, her wiha pêşkêşkirina stranên folklorî û welatparîzî.
Hêjayî bîranînê ye ku di Nîsana 2017'an de, baregeha weşanê ya li Çiyayê Qereçoxê rastî êrîşeke hovane ya asmanî ya Tirkiyê hat ku di encamê de hejmarek ji karmendan (Şêlan, Heqî û Rêwan) şehîd bûn.
Paşê, ji ber derdewamiya êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêmê ku qada ragihandinê jî hedef girt. Radyoyê bi rêya pêlên nû, medyaya civakî xebatên xwe berfireh kir, da ku dengê wê bigihîje rêjeyeke berfirehtir ji guhdarvanan hem li hundir û hem jî li derveyî Sûriyeyê.

### Rola jin di radyoyê de

Herwiha, radyoyê roleke girîng di bihêzkirina jinan û bilindkirina dengê wan de lîstiye, û cîhên mezin ji bernameyên jinan re veqetandiye ku li ser pirsgirêkên jinan di civakê de, mafên wan û têkoşîna wan a ji bo wekheviyê nîqaş dikin. Hebûna jinan li Radyoya Rojava ne tenê mijarek li ser weşanê bû, lê hebûnek rastîn di nav tîmê de bû. Pêşkêşvan û rojnamevanên jin di amadekirin û pêşkêşkirina bernameyan de beşdar bûn, û îspat kirin ku jin bi qasî ku di refên berxwedanê de ne, dikarin di pêşengiya medyayê de jî cih bigirin.
Radyo niha li ser pêlên jêrîn weşanê dike: Kanton: 91.2 FM. Bajarê Dêrik û Koçerat: 88.9 FM. Kantona: 93.5 FM. Dêrezor: 95.0 FM.

### Radyoya Orkêş 2014

Radyo Orkêş di 1'ê Îlona 2014'an de hat avakirin. Navenda radyoyê li Amûdê ye û li ser pêla 103 û li Qamişlo li ser pêla 101 tê guhdar kirin. Radyo Orkêş radyoyeke herêmî ye ku hemû rojevên li herêmê dişopîne û bi zimanê Kurdî û Erebî weşan dike. Radyo di saet 7'ê sibê de weşana xwe bi Sirûda Niştîmanî (Ey Reqîb) dest pê dike, heyanî 12'ê êvarê weşana xwe didomîne. Weke nav ji Girê Muza wergirtiye ku berê navê wê Orkêş bû û girêdayî bajarê Amûdê ye. Hêjayî gotinê ye ku Orkêş FM bi komek rewşenbîrên welatparêz dest pê kir û bi kêm derfetan xebat da meşandin.
Di naveroka radyoyê de her serê saetekê kurtenûçe bi her du zimanan tên dayîn, 5 bûltenan pêşkêş dike ji wan (2 bultenên Kurdî, yek jin, yek Erebî û yek jî berhevkirina rojê ye). Her wiha 17 bernameyên rengûren hene (Sibeha Orkêş, tenduristî, xizmetguzarî, aborî, jîngeh, siyasî, çandî..hwd) ku ev rojane dibin mijara weşana radyoyê. Her wiha bernameyên heftane hene ku mijarên girêdayî (Jin, siyaset, zarok, mûzîk, wêje, ciwan, yadê û bernameyên bîrdozî). Ji van bernameyan zêdetir hin mijarên ku weşanê zengîntir dike gelek caran dikevin weşandê wek (Çîroka stranekê, têgîn, ramanên Serok, dengê nemir, çîrok, stranên floklor..hwd ). Di radyoyê de 13 endamên fermî hene û 10 endamên ku dibin alîkar dixebitin. Orkêş FM her sal di 1'ê Cotmehê de derbasî weşana xwe a nû dibe.

### Radyoya Xabûr 2015

Radyoya Xabûr FM yek ji destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye ku hewl dide jiyana hevbeş di navbera gelan de pêş bixe ye. Radyo Xabûr di 14'ê Gulana 2015'an de dest bi weşanê kir ku navendê wê li Hesekê bû û ji aliyê tîmeke ji çar kesan ve hate damezrandin. Radyoya Xabûr bi zimanên Erebî û Kurdî weşanê dike. di heman demê de bi drûşmeya "Dengê biratiya gelan" ragihandina azad ji xwe re esas girt.
Radyoya Xabûr li ser pêla 96.30 weşanê dike, û bernameyên wê mijarên civakî, siyasî, çandî, hunerî, aborî, rewşenbîrî, jin, ciwan, zaroktî û nûçeyan vedihewîne. Xebatkarên radyoyê Kurd û Ereb in, di hemû waran de perwerdeyên bîrdozî û meslekî werdigrin ku hemû jî li ser (pêşkêşkirin, amadekirina bernameyê, nûçe, montaj, teknîk û kemîravaniyê) perwerde dîtine û dibînin. Her wiha niha di radyoyê de 14 kes xebat didin meşandin.
Ji bilî bulten, nûçe û weşanên sibê, radyo çend bernameyan amade dike ew jî ev in: (Şervanên Azadiyê, Êvara Xabûr, Daxwazên Stranan, Dengê Ciwanan, Bûyer, Berhevkirina Hefteyî, Nûjen, Bernameya Zarokan, Bernameyên Hunerî û Bernameyên Rewşenbîrî. Her wiha bernameyên jinan, bernameyek olî, wêjeya şoreşger, analîzên îro, hêviyên sibê û Bernameya Şehîdan a bi navê Cangoriyên Azadiyê) hene.
Radyo rêbaz û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û têgeha neteweya demokratîk esas digre. Her wiha ji ber pirrengiya herêrê armanca radyoyê yek jê ew e ku muxateba hemû pêkhateyan Kurd, Ereb, Suryanî, Asûrî û Ermeniyan, dike.

### Radyoya Dirbêsiyê 2016

Radyo Dirbêsiyê di 1'ê Çileya 2016'an de hat damezrandin. Radyo Dirbêsiyê weşana xwe li ser asta navçeyî dide meşandin ku li Dirbêsiyê û gundewarên wê li ser pêla 108 tê guhdarkirin. Naveroka bernameyên wê (Siyasî, jin, werzîş, çand, xizmetguzarî, ciwan..hwd). Radyo hebûna jin û ciwanan a ku li ser hatiye avakirin ji xwe re esas digre. Di dirêjahiya salên radyoyê de, gelek caran neçar man ku pêlên weşana xwe bidin guhartin ji ber ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve dihat bandorkirin.
Dema ku radyoya Dirbêsiyê hatiniye avakirin pêwîstiyeke herêmê hebû ku radyoya nêzî deng, zehmetî, êş û destkeftiyên civakê be. Ji ber wê jî biryara avakriina radyoya Dirbêsiyê li ser bingeha daxwaza gelêrî bû, naxwesim ji destpêkê rêjîma Bass de ev here her tim piştguhkirî bûn û tu girêngî ji wan herêman re nedihat dayîn. Her wiha di radyoyê de 15 xebatkarên jin û mêr kar dikin. Di heman demê de li ser medya dijîtal jî hemû bername û weşan tê belavkirin û di rêya înternetê li ser aplîkêşina radyoyê mirov li ku derê cîhanê dibe dikare guhdar bike.

### Radyoya Star 2017 (Jin)

Radyo Star a ku di weşana xwe de jin esas digre, di 15 'ê Kaûna 2017'an de di bin dirûşmeya "Dengê jin û jiyanê" dest bi weşanê kir. Navenda Radyoyê li Tirbespiyê ye. Di destpêkê de weşana xwe li ser asta Tirbespiyê dikir û di destpêka 2019'a de li ser asta kantona Cizîrê xebat da meşandin, niha jî amedekariya weşana li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bidin meşandin, dikin. Naveroka weşana wê bi van bernameyan dagirtiye (Dayîk, Jineolojî, bernameya zarokan, Roj baş bi zimanê Kurdî û Erebî, rojê sê caran nûçe bi her du zimanan tên pêşkêşkirin). Li gorî siyaseta radyoyê weşangeriya wê bi reng û dengê jin e. Li ser medya civakî jî weşana xwe dike û bernameyan bi dîmen jî tên amedekirin.
Hêjayî gotinê ye ku di Rojhilata Navîn de yekemîn radyon jin Radyoya Star FM e. akîba wê hemû jin in û 7 endamên jin tê de kar dikin.

### Radyoya Sawt El Heyet 2018

Radyoya Sawt El Heyet di 1'ê Tebaxa 2018'an de li bajarê Hesekê hat avakirin û bi zimanê Erebî weşana xwe dike û li hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê guhdarkirin. Radyoya Sawt El Heyat hemû mijar û geşedanên ku li herêmê diqewimin radighîne. Naveroka radyoyê bi van beş û bernameyan dagirtiye (Nûçe, navenda nûçeyan a jin bûyerên heftê, bernameyên siyasî, bernameyên jin, dosyayên taybet.. hwd. Her wiha gelek bernameyên sibê, olî, civakî, ciwan û zarokan hene). Di radyoyê de bi giştî 14 kes û 8 nûçegihan kar dikin.

### Radyoya Dicle/Dêrik 2021

Radyo Dicle li ser şopa çapemeniya azad ku deng û rengê Bakur û Rojhilatê Sûriyê derxîne pêş xebat dide meşandin. Radyo Dicle di 18'ê Gulana 2021'an de dest bi weşana xwe kir. Dicle FM li li Herêma Dêrik û derdora wê 18 saetan bi zimanê Kurdî û Erebî weşana xwe dike. her wiha li ser du pêlan radyo tê guhdarkirin 100.3 di bajarê Dêrikê de û 89.7 li derdor dêrikê ku heyanî Şengalê diçe. her wiha bi rêya înternetê ji derveyî Kurdistanê Dicle FM li welatên cîhanê û Ewropayê gelekî tê guhdarkirin û ji wir jî tevlî bernameyên radyoyê dibin. Sê beşên sereke yên radyoyê hene ew jî (Beşa kontrolê, beşa nûçegihanî û beşa radyoyê ye).
Radyoya Dicle herî zêde bi zimanê Kurdî weşanê dike ku bernameyên curbecur yên weke (ekolojîk, jin, siyasî, civakî, tenduristî..hwd )weşanê dike. Li gorî ku hatiye destnîşankirin herî zêde bi êvarê weşana bi zimanê Erebî tê kirin. Rojevên ku Dicle FM digre dest rojevên li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Sûriya, Rojhilata Navîn û Cîhanê ne. Lê bêhtir rojevên herêmî esas digre.

### Radyoya Şehba 2023

Radyoya Şehba FM (107.5), di Çileya sala 2023'an li bajarê Helebê dest bi weşana test kir û di Pûşbera heman salê de weşana xwe ya fermî destpêkir. Di destpêka wê de kurte nûçe û bultena nûçeyan di weşanê de bû, her wiha di sala 2024'an de bernameyên curbecur yên hunerî, jin, rojbaş, daxwaz, bernameyek ji bo koçberên Efrînê kete weşanê. Lê piştre di heman salê de piştî ku rêjima baasê ket û hikumeta veguhêz hat şûna wê, bername ji ber rewşê hatin îbtalkirin. Di dema niha de di weşanê de sibê rojname tên xwendin û kurte nûçe û bultena wan tên dayîn. Endamên radyo 6'in, çar hevalên jin û du hevalên mêr in.

# Xwişk û biratiya gelan di bin gef û êrişan de ne pêkan e!

Dewleta Tirk her dem behsa xwişk û biratiyê dike, lê li dijî çareseriyê û demokratîkbûnê derdikeve û gefan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Herwiha ne mûmkin e xwişk û biratiya gelan di bin gef û êrişan de pêk bê, lê bi wekhevî û yekîtiya gelan pêkan e.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**



**Sozên derew û tunehesibandina netewan**

Piştî têkçûyina Împaratoriya Osmanî, di şerê cihanê yê yekem de Kurd û Tirk bi hev re parastin kirin. Her çiqas di destpêka parastinê de ji Kurdan re soz hatibin dayîn ku dê piştî serkêftina parastinê Kurd jî dê mafên xwe bigrin, lê belê ev soz nehate pêkanîn. Di Peymana Lozanê de hemû mafên Kurdan hatin binpêkirin û welatê Kurdan Kurdistan di navbera Tirkiyê, Iraq, Îran û Sûriyê de hat parvekirin. Komara Tirkiyê ku li ser bingeha netew dewletê ava bû, gelê Kurd jî di nav de hemû gel û netewên cûda ên di bin serweriya Tirkiyê de dijîn tune hatin hesibandin û li dijî wan gelan polîtikayên pişaftin û qirkirinê hatin meşandin. Tunehesibandin û qirkirin bû sedema pirsgirêka Kurd, heta roja me ya îro jî kuştin, komkujî û hilandin berdewam e, li hemberî wê jî berxwendana Kurdan ranewstiya ye.

**Dewleta Tirk piştî gelek hewldanan, dîsa neçar bû were pêvajoyê**

Ji ber polîtikayên tunehesibandin û qirkirinê, gelê Kurd gelek caran rabû serhildanê. Lê hemû serhildan di encama komkujiyên mezin de têkçûn. Herî dawî di sala 1978’an de bi Rêbertiya Rêber Apo Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) li dijî îmha û tunehesibandinê têkoşîna çekdarî dest pê kir. Di encama salên şerê çekdarî de gelek caran pêvajoyên çareseriya pirsgirêka Kurd hatin destpêkirin. Lê ev pêvajo jî bi sedemên cur bi cur negihiştin meriyetê. Herî dawî di sala 2013-2015’an de pêvajoya çareseriyê destpêkir. Lê ev pêvajo jî negehişt encamê. Bi têkçûyîna pêvajoyê re desthilata AKP’ê plana “Çokdanînê” xist meriyetê. Di pêvajoya 10 salan de “plana çokdanînê” negihişt encamê û dewlet neçar ma careke din pêvajoya çareseriyê bide destpêkirin.

**Pêvajoya nû bi gavên hevbeş gerek e, xapandin jî ne mûmkin e**

Di 22’ê Cotmeha 2024’an de piştî banga Serokê MHP’ê Devlet Bahçelî ya ji Rêberê Apo re kiribû, pêvajoyek nû dest pê kir. Rêberê Apo jî di 27’ê Sibatê de banga “Aştî û Civaka Demokratîk” kir û bi vê banga dîrokî pêvajo derbasî qonaxeke nû bû. PKK’ê jî li ser banga Rêber Abdullah Ocalan biryara xwe fesîhkirinê girt û herî dawî jî di 11’ê Tîrmehê de 30 gerîlayên koma Aştî û Civaka Demokratîk li Silêmaniyê merasîma çek şewitandinê li dar xistin. Piştî van gavan li Meclisa Tirkiyê Komîsyona Demokrasî Xwişk- Biratî û Hevgirtina Mîllî ava bû û hêj jî xebatên komîsyonê berdewam dikin.

Xwişk-biratiya gelan ne bi zorê lê bi wekhevî û qanûnên demokratîk dibe

Xwişk-biratiya gelan ne bi darê zorê û bi serdestiyê pêk tê. Ev ne pêkan e. Gel tenê bi awayekî wekhev dikarin bibin xwişk-bira û yekîtiya gelan pêk bînin. Ji bo wekheviya gelan divê qanûn bên amadekirin. Bi qanûnan, wekheviya gelan divê were mîsogerkirin. Divê dewleta Tirk dest ji polîtikayên ku li dijî pêvajoyê, xwişk û biratiya gelan e berde, da ku ev pêvajo bigiheje encamekê û aştiyeke mayînde pêk were. Ji bilî vê jî rêyek nemaye. Ji bo wekheviyê jî divê qanûnên ku mafê ziman, siyasî û civakî mîsoger dikin, bên amadekirin.



**Dewleta Tirk siyaseta xetamandina pêvajoyê dide meşandin**

Xetmandina ku îro li Tirkiyê tê jiyankirin sedemên xwe jî nepêkanîna xwişk û biratiya gelan e ya ku dewlet li dijî wê dixebite, di heman demê de nepêkanîna pêvajoyê ji aliyê dewletê ve. Dewleta Tirk ne tenê di hundirê Bakurê Kurdistanê de siyasteta xetmandina pêvajoyê dide meşandin, ew li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî gefan dixwe. Tişta mirov hêrs dike ew e ku dewleta Tirk bi xwişk û biratiyê bang dike, lê ew bixwe li dijî wê kar dike û nahêle ew yek pêk were. Mînaka wê Erdogan bi zimanê xwe dibêje em naxwazin Sûriyê bê parçekirin, lê gelo wî ji lingê xwe nepirsiye çima di Sûriyê de heye. Erdogan ji dema ketina Eseed û heya niha hewldanên mayendekirina xwe li Sûriyê, dike.

**Zimanê Erdogan xweş e lê filên wî reş in**

Di cîhanê de caran nehatiye dîtin ku kesên bixwazin çareserî pêk bê, ji çareseriyê birevin, lê Tirkiyê vê yekê dike. Zimanê Erdogan xweşe lê filên wî reş in, bi gotinên wê xuya dike ku her tişt hêsan e ango wan gotinan di jiyanî de kiriye piratîkê de. Dewleta Tirk her dem qala xwişk û biratiyê dike, lê li dijî çareseriyê û demokratîkbûnê derdikeve û gefan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Dijmintiyê li dijî Kurdan û gelên din yên Sûriyê dikin, piştgiriya paşverûtiya hikûmeta veguhêz dike û dixwaze desthilata wan serwer bike. Ev jî tê wateya avakirina Sûriyeke tarî ya ji rejima Baas xirabtir.

**Tirkiyê hevdîtinan asteng dike ji bo di Sûriyê de bimîne**

Tirkiye, bi hatina hikumeta veguhêz ya li ser desthilatê hewl dide li ser Sûriyê serweriya xwe ava bike. Hikumeta Veguhêz ya Sûriyê ji hevdîtinên bi Rêveberiya Xweser re direve, li pişt vê revandinê jî Tirkiyê heye. Bi piştigiriya Tirkiyê siyaseta mijûlkirinê dimeşînin û dixwazin hêzên navnetewî jî ji navberê derxînin.

**Xwişk û biratiya Bakur û Rojava hev temam dikin**

Xwişk û biratiya gelan li Bakur Kurdistanê, hem jî li Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev ve girêdayî ne, ne ku ji hev qût an dûr in. Ji ber dema dewleta Tirk gavên cidî di vî alî de bavêj e û ji xerabiyê dûr bikeve, êriş û gefên xwe li ser Sûriyê rawestîne û rê li ber hevîdtinan asteng neke, wê demê maseya çareseriyê wê derkeve holê, Bakur û Rojava jî ji hev ne qût in, xwişk û biratiya wan hev temam dikin. Pêvajoya ji bo Tirkiyê, pêvajoya ji bo Sûriyê ye jî. Wekî ku bi salan li Tirkiyê rewşên aloz tên jiyankirin, Sûriyê jî heman rewşê jiyan dike, niha guhertina demoratîk pêwîst dike, êdî polîtîkayên dewletê nema bi encam in. Ji ber ne mûmkine xwişk û biratiya gelan di bin gef û êrişan de pêk bê.



## Siyasetek lewitî dimeşe

**Ahmet Aktaş**

Li cîhanê gelek bûyerên ecêb û matmayî rûdidin û siyasetek berovajî tê meşandin.
Aliyê balkêş jî, yên serkêşiyê ji vê siyaseta lewitî û kiryarên malxerab re dikin, serokên dewletên hegemonên cîhanê; DYEyê û Rûsya ne.
Bivêja gelîrî tîne bîra miovan; “heke mele wisa bikin gelo cemaat çi nakin”?
Jixwe, wexta Trump û Putin siyasetekê an hilwestekê nîşan didin, piraniya serokên dewletan weke pezê bikevin kûyê li pey wan dimeşin.
Êdî gel nayê bîra van serokan, derd û êşên gelan ne xema wan e, di mejî û hişê wan de, bi tinê temendirêjiya desthilatiya takekesiya wan û berjewendên malbatên wan hene.
Hema li mînaka Trump binêrin; êdî li goreyî kêfa xwe ya takekesî, keç, kur û zavayê xwe jî xistiye nava siyasetê û diplomasiyê û karê dewletê wisa dimeşîne.
Hema, Receb Erdogan li ser şopa wî û weke “fotokopiyên hev” mîna şîrketan dewletê dimeşînin!
Colanî jî weke şopdarê wan dimeşe; ji bo birêvebirina hemû karê rêveberiya Şamê(Suriyê) her sê birayên xwe dane rex xwe û bi destê wan dewletê dide meşandin!(Beşar Esat jî, bi heman şêwazê, bi birayên xwe desthilatiya xwe dimeşand)
Di vê serdema dawî de, ev siyaset û hilwestên lewitî derketiye asta herî bilind, jixwe hemû civîn û hevdîtinên xwe yên çendkesî an pirkesî hemûyan, weke “civînên bilind, giring, watedar” bi nav dikin.
Weke mînak, civînên NY û Civînên Rojhilata Navîn(bi taybetî ya Misrê).
Di van civînan de, ji bo berjewendên gelan ti biryar nîne.
Lê ji bo Trump û Putin hinek biryar hene.
Ma şerê Ukrayna hat rawestandin û aştî pêkhat?
Ma li Rojhilata Navîn dawî li şer hat? Na xêr.
Di rûre weke şersekinandinê heye, lê van hevdîtin û civîn hemû amadekarî ye, ji bo şerê mezîn ê dahatû yê cenga 3yan a cîhanê ye. Jixwe êrîşa dijî Îranê di rêzê de ye!
Di nava van heftuleftan de mijara herî belloq û lewitî hilwesta bi Colanî re ye!
Colaniyê ku li arşîva DYEyê teroristekî navdewletî bû, ji bo girtina wî 10 milyon dolar hatibû terxandin, lê çawa ji aliyê CIA ve, pêşî li Iraqê, paşê li Idlibê hat perwerdekirin û ji nişka ve anîn li Şamê û weke Serokê Dewleta Sûriyeyê hat ragihandin! Sosret e ne!
Teroristiya navdewletiya Colanî dan jibîrkirin û birin civîna bilind a NY a New Yorkê.
Vê dostaya Trump a li gel Colanî, ew bi Putin jî şêrîn kir û bi lezgînî vexwend Moskovayê.
Di vê serdemê de pîvanên dewletên burjuvazî jî hatine binpêkirin. Êdî hewcedariyê nabîinin ku bêjîn “ev kes berê terorist bû, nuha bûye camêr, demokrat û hwd”!
Ji bo Receb Erdogan jî heman pîvanên yasayî û exlaqî tevliheev û berovajî bûne. Jixwe berî herkesî wî Colanî himbêz kir. Lê berovajî vêya, çû civîna bilind a Misrê li ser cenazeyê birayê xwe Hemas fatihe jî xwend!
Divê van desthilatdarên hegemon jibîr nekin, ku çawa îro dikarin bi lez hemû pîvanên yasayî û exlaqiyên navneteweyî binpê bikin, wê sibê bi heman lezê ev desthilatiya xwedî siyaseta lewitî û malxerab were hilweşandin û hişmendiya xwedî felsefeya rêya sisya a Rêber APO bi ser dikeve!



# ‘Dewlet pêvajoyê giran bi rê ve dibe û çapemeniya wê bi şêwazê salên 90’î tevdigere’

Rojnamevan Serdar Altan da zanîn ku di serdema desthilata AKP’ê de ruhê çapemeniyê hate kuştin û tu têkiliya çapemeniyê bi gel û heqîqetê re nema û got, “Dema AKP bû desthilat, ev car bû çapemeniya alîgirê AKP’ê û dîsa dijberiya Tevgera Azadiyê û aliyên demokrat û aştîxwaz kirin.”

**Esma Mistefa/Qamişlo**





Li hember pêvajoya ku ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatiye destpêkirin, bi taybet di Tirkiyê de xebatekî girîng tê meşandin. Lê belê ji bo biserxistina vê pêvajiyê zimanekî dijber û neyînî ji aliyê çapemendiya dewleta Tirkiyê ve tê bikaranîn, herwiha heyanî niha komisyona ku hatiye avakirin derbasî gel Rêber Apo nebûye. Derbarê vê mijarê de rojnamevan Serdar Altan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Pêvajoyeke dîrokî ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hate destpêkirin, herwiha komisyoneke taybet ji bo birêvebirina pêvajoyê di Trikiyê de hate avakirin. Gelo hûn dikarin rêveçûna vê pêvajoyê binrxînin û çima heya niha komisyon derbasî gel Rêber Apo nebûye?**

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ku ji hêla Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ve hatiye destpêkirin di qonaxeke girîng de berdewam dike. Di navbera 7-8 vê mehê de gelek bûyerên girîng qewimîn. Di serî de biryara feshkirina PKK’ê û çek şewitandina gerîlayan di cîhanê de deng veda. Di vê pêvajoya çend mehan de birêz Ocalan bi nêrîn û perspektîfên xwe her tim rê li ber pêvajoyê vekir. Her gotinekî wî dibû rojev û dihat nîqaşkirin. Manîfestoya ku mirov weke paradîgmaya demê dikare binirxîne gelek tişt ji bo me digot. Ne tenê ji bo gelê Kurd, herwiha ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn û gelên cîhanê weke manîfestoya serdemê ye. Rêzdar Abdullah Ocalan ji bo tevahiya cîhanê careke din got ku li dijî cîhana ku ji hêla kapîtalîzmê ve hatiye dorpêçkirin, civakek komînal û azad pêkan e. Civaka xweser û azad wê karibe baştir biafirîne û cîhanek wekhev û di nava aştiyê de saz bibe.

Helbet ev nêzîkatî ji bo tevahiya Kurdistan û Tirkiyê şensek mezin bû. Bi taybet Tirkiye ya ku ewqas di bin nîrê zilm û zorê de hatiye çewisandin, pêwîst bû sûdek mezin wergire ji vê şensê. Piştî gavên ji hêla PKK’ê ve hatin avêtin tevahiya raya giştî li benda bersiva dewletê bûn. Lê belê di ser destpêka pêvajoyê de ewqas dem derbas bû jî ji hêla dewleta Tirk ve gavek şênber nehatiye avêtin. Ev yek jî nerazîbûnek mezin bi xwe re anî.
Wisa xuyaye hikumeta AKP’ê dixwaze pêvajoyê hinek giran bi rê ve bibe. Ev yek di nêzîkatiya komsyona ku li Meclisê hatiye avakirin de jî xuya dike. Diviya komîsyon heta niha bi rêzdar Ocalan re hevdîtin pêk anîbûya, lê belê ev yek hêjî pêk nehatiye. Ez bawerim ew jî li bendê ne ku Erdogan di vê derbarê de biryarê bide. Dawiya dawî helbet wê li birêz Ocalan guhdarî bikin lê ev yek çiqas zû pêk bihata ewqas baş bû. Ji ber ku pêvajo vê nêzîkatiyê nikare hilgire. Ger rewşek ne baş bi pêş bikeve kes nikare ji bin vê yekê derkeve.

**-Zimanê çapemeniya Tirkiyê weke niyeta hikumetê ye, heya niha jî pêvajoyê weke zimanê teslîmiyetê digrin dest û bi awayekî çareser nateysînin. Gelo hûn vê yekê çawa dibînin?**

Çapemeniya Tirk, li bîra me tê nayê di pirsgirêka Kurd de bi heman ziman û şêwazê tevdigere. Zimanê wî zimanê dewletê ye, zimanê şer e, zimanê zilm û zordaran e. Dema derbeya 12’ê Îlonê ya 1980’yan pêk hat, li dijî gel weke çapemeniya cuntakaran tevgeriya. Di salên 90’î de li dijî Kurdan weke çapemeniya artêşê tevdigeriya. Me wan weke çapemeniya bi apolet binav kir. Dema AKP bû desthilat, ev car bû çapemeniya alîgirê AKP’ê û dîsa dijberiya Tevgera Azadiyê û aliyên demokrat û aştîxwaz kir. Niha jî em lê dinêrin, li dijî aştiyê alîkariya şerxwazan dike. Niha em berê xwe didinê du aliyê ve sekna çapemeniya Tirk heye. Aliyek jê ku nêzî hikumetê ne dixwazin ji vê pêvajoyê serkeftinek ji bo AKP-MHP’ê derxin. Bi weşanên xwe Tevgera Azadiyê biçûk dixin û hikumetê mezin dikin. Dibêjin tu behs û bazar tineye, PKK’ê bi van gavavêtinên xwe teslîmiyetê qebûl kiriye. Ewqas ked û hewldanên birêz Ocalan û tevgêra wî dixwazin li valahiyê derxin. Helbet em van baş nasdikin. Ev, ew kesin ku di her serdemê de li cem dewletê, li cem desthilatan cihê digrin in.
Aliyê din ew kes in ku dibêjin qaşo em muxalîfin. Xwe nêzî partiya CHP’ê dibînin û di rastiyê de bêhtir xwe wekî xwediyê dewletê pênase dikin. Piraniya rojnamegerên ku di van saziyên çapemeniyê de dixebitin ew kes in ku di salên 80’î û 90’î de alîgiriya darbekaran û artêşa dagirker dikirin. Niha wekî muxalîf xûya dikin lê di rastiyê de derdê wan yê sereke dijberiya Kurdan e. Naxwazin ku Kurd li ser ruyê cîhanê bibin xwedî tu tiştî. Kurdan weke qebîleyeke Tirkan dibînin, weke xûlamên xwe li wan dinêrin.
Di eslê xwe de ev herdû alî jî di dijminahiya Kurdan de tên cem hev û dibin yek deng. Hem alîgirên hikumetê, hem yên xwe wek muxalîf nîşan didin rojnamegeriyek bi şeref nakin. Hem pênûsa xwe firotine, hem rih û mejiyê xwe. Benê wan di destê dewlet û desthilatan de ye. Bi ku ve bikişînin bi wir ve diçin. Ev yek jî rewşek ne baş derdixe holê. Bi taybet di serdema desthilata AKP’ê de rihê çapemeniyê hate kuştin, hate qetilkirin. Wisa kirin ku wate û naveroka çapemeniyê hate valakirin. Rojnamegerî bu amûrê destê desthilatê. Tu têkiliya çapemeniyê bi gel re nema. Dema wisa be helbet wê encam jî ev be. Ji ber wê tu hêviya gel ji van derdoran nemaye.

**-Ji bo pêvajoya ku hatiye destpêkirin, divê ragihandina dewletê bi taybet zimanekî çawa bi kar bîne, her wiha ger wiha berdewam bikin wê encam çi bin?**

Helbet dema em behsa ragihandina li Tirkiyê dikin ji bilî van herdu aliyan rojnamegeriyek ku nirxên çapemeniyê diparêzin jî heye. Bi taybet çapemeniya Kurd ku em wê weke Çapemeniya Azad binav dikin, li hember vê rewşa ne baş berxwedaneke bêhempa dimeşîne. Dîsa hin çapemeniya çep û sosyalîst jî di nava vê berxwedanê de cîh digrin. Her wiha weke ferd, hin rojnamevan û alî jî hene ku dixwazin hinekî bi exlaq tevbigerin. Ev kes ji ber ku serî ne tewandine ji çapemeniya alîgir û şerxwaz hatine durxistin.
Hebûna çapemeniya azad û van derdorên em behsê dikin hêvîyek xûrt ava dike. Em zanin ku di gel ewqas zilm û zor û çewisandinê jî hin alî hene ku wê mafê gel, mafê aştîxwazan biparêze.
Di vê serdema pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de pêdivî pê heye ku ev çapemeniya aştîxwaz bêhtir xwe bi hêz bike û mafê gel, mafê Kurdan, mafê aligirên demokrasiyê biparêze. Her wiha ji bo van derdorên ku dijberiya aştiyê dikin bandora wan kêm bibe di nava hewldanê de be. Li aliyê din divê mirov bang li wê çapemeniya aligîr û çapemeniya qaşo muxalefetê dikin jî bike da ku dev ji vê zimanê kirêt berdin. Ji ber ku tevahiya gel ji vê zimanê şerxwaz aciz e. Civak êdî aştiyeke mayînde û bi rûmet dixwaze. Zimanê şer feyde li tu kesî nake. Ger piştgiriyê nadin pêvajoyê jî qet nebe bê kêmanî bila dengê xwe bibirin, dijberiyê nekin. Em bawer in dema ev pêvajo bi ser ket wê herkes azad bibe. Her wiha wê çapemenî jî bikeve rêyeke rast û feydeya mezin jî wê li ragihandinê bike. Bi vê wesîleyê em careke din ew hevalên me yên ku li dijî zilm û zordariyê, di gel ewqas çewisandin û pêkutiyan jî li ber xwe didin û mafê gel yê aştîxwaz diparêzin silav dikin û berxwedana wan pîroz dikin.